

**Qanûnên cihanîne bona Sindoqa Cebirandina Ziyane kesên gorî û kesên ziyandîtî ji kirya-  
rên koma veşartî ya Sosyalîst a Neteweyî**

Rêzikên rêvebirinê yê wezaretê koçberî, dadwerî û piştgiya ji bikarêneran li Tûrîngenê....

(4226-4278/2018)

**1. Babetên seretayî**

1.1 Civata parêzgehî ya Tûrîngenê ji riya pesendnameya roja 29ê Îlona 2017an (çapa 6/4576) diyar kiriye:

„1. Koma têrorîst a veşartî ya sosyalîst a neteweyî ya rastgir (NSU) kuştîye

Enver Şîmşek

Evdilrehîm Ozûdogrû

Silêman Taşkoprû

Habîl Kilîç

Mihemed Tûrgût

Îsmâil Yaşar

Θεόδωρος Βουλγαρίδης (Têûdor Bolgarîdîs)

Mihemed Kûbaşîk

Halît Yozgat

Mîşil Kîzûtêr

Bi zêdegavî û rastşopiya tund. Ji billî vê yekê, çend kes bi riya bombe-  
danîne koma têrorîst a rastşop a NSU'yê li xwaringehka Nûrênbêrgê li  
pişka başûrî ya bajêr li kolana Keupstraße û li Kolnê li kolana Probsteigas-  
se birîndar bûn. Li êrîşên ku bi armanca dîzîne pêk hatin, goriyên din bi  
giranî birîndar bûn.

2. Li gorî belgeyên ku ketine ber destê Komîteya Lêkolînê ya 5/1 a Civata  
parêzgehî ya Tûrîngenê, rayedarên ewlehiyê yê parêzgehê li pey kesên  
reviyayî bi navê Uwe Bûnhart (Uwe Bönhardt), Uwe Mondlos (Uwe  
Mundlos) û Bêate Çêpê (Beate Zschäpe) ser neketin. Hevkariya navbera  
rêvebiriya berê ya parastina qanûna bingeîn li Tûrîngenê û rêvebiriya

polîsê cezayî ya parêzgeha Tûrîngenê ji ber rikeberî û nebûna pêbaweriyeka dualî diyar nebû ku rê li ber pêkhatina lêkolînên serketî girt. Ji ber vê liv û tevgera neçê, bilez rê li ber çalakiya vê komê nehat girtinê, lê wan nekarîn kiryarên xwe di heyameka dirêj da bidomînin.

3. Civata parêzgehê berpirsiyariya xwe ya siyasî derheqê gorî, xizm û kes û ziyandîtiyên qetlan, êrîş û dizînen têrorîstî yê rastgirên NSU digire ser milê xwe."

Li gorî van belgeyan, Civata parêzgehî ji dewleta Parêzgehê xwestiye ku sindoqeya cubrankirina zîyanê bona gorî, xizm û ziyandîtiyên ji ber kiryarên NSU'yê damezirîne û çarçovekê ji bo pêvajoyeka ne-borokratîk ji bo dayîna diravê zîyanê di demê da diyar bike.

- 1.2 Li bernameya mûçeya parêzgehî li bernameyeka cuda li Wezaretê Koçberî, Dadwerî û Piştgiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê, di bin pişka 0501 bi navê 68103 ("Sindoqa Cebirandina Zîyanê ji bo gorî, xizm û kes û ziyandîtiyên ji ber kiryarên têrorîstî yê sosyalîstî"), bo sala 2018an mûçeyek bi qasî 1.500.000,00 Euro hatiye berçavgirtin. Li gorî şiroveyên bernameya mûçeya parêzgehî, ev dirav li ser esasa pesendnameya parlamana Tûrîngenê ya roja 29ê Îlona 2017an hatiye berçavgirtin û ji bo pêkanîna sindoqeya cebirandina zîyanên xizmên gorî û ziyandîtiyên kuştin û bombedanînen koma veşartî ya sosyalîstî pêk hatiye.

## **2. Armanca xizmetan**

Xizmetên bi hejmara 1.2 ya mûçeya (Sindoqa Cebirandina Zîyanên Goriyan) nîşana pejirandina berpirsiyariya siyasî ne û ji ber derd û rencên ku gorî, xizm û kes û ziyandîtî tûşî wan bûne, tên raberkirin. Ewn aji bo dabînkirina xercê jîyanê û fêrbûna kar nehatine berçavgirtin. Îdiaya hiqûqî derbarê xizmetên sindoqa cebirandina zîyanên qurbaniyan tune.

## **3. Hêjatî, Pêvajo**

- 3.1 Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê derbarê xizmetên Sindoqa Cebirandina Ziyânê Goriyan bi awayê lezgîn û ne-borokratîk û li gorî daxwazê biryarê dide. Heke şert û mercên hilêxistî li xala 4 û 5 hebin, xizmet dikarin bên raberkirin.
- 3.2 Xizmetên Sindoqa Cubrankirina Ziyânê Goriyan li ser esasa daxwaza nivîskî (Wek mînak nivîsandî an bi E-Nameyê) bo kesê daxwazker tî raberkirin; Nûneratî rêpêdayî ye. Ev daxwaz divê bi zimanê almanî bo Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê were raberkirin. Ji bo hêsankirinê, divê forma daxwaza raberkirî ji riya malpera Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê were bikaranîn. Daxwaz divê hevrê belgeyên were raberkirin ku agahiyên hilêxistî li daxwazê piştrast dikin. Belgeyên li vî warî da divê bi awayê taybet, pêkhatî ji belgeyên têkildarî zewacê an welatê sereke yê daxwazker (Li babetên hejmara 4) û belgeyên pizîşkî yê têkildarî sedem û ziyânê çêbûyî (Li babetên hejmara 5) bin; Bi giştî kopiya (Kopya an belgeyên Skenkirî) têrê dike.
- 3.3 Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê dikare bi mebesta hêsankirin raberkirin û hilkolandina şert û mercên ximzetan, nêrîn an agahiyên li gorî parastina dane û zanyariyan werbigire. Bi awayekî taybet Rêvebiriya Fêdêral a Dadweriyê dikare daxwaz bike ku hin agahî û zanyarî derbarê naveroka biryarê jibo dayîna xizmetên şert û mercên dijwar bona goriyên êrîşên tund û şidetê bo daxwazker bên raberkirin.
- 3.4 Kesê daxwazker divê bi raberkirina daxwazê, razîbûna xwe ragihîne ku agahiyên wî yê kesane ji bo cihanîna pêvajoya cebirandina ziyânê bên berhevkin, proseskin û bikaranîn. Heke razîbûn neyê ragihandin an tenê pişkek were ragihandin û heke şert û mercên xwednamercbûnê bi tu awayî nekarin bên diyarkirin, ev yek dê li ser ustiyê daxwazker bixwe be.
- 3.5 Daxwaz divê herî pirr heta (*Binivîse: Sê mehan piştî cihanîna qanûnê cihanîne*) ji aliyê Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê hatibe wergirtin. Ev heyameka diyarkirî ya nevergarbar e. Daxwazên wergirtî di rojên piştî vê

heyamê dê neyên berçavgirtin. Derbarê daxwazên wergirtî di dema musayît da, herî pirr heta 30ê Mijdara (Novamber) 2018an biryar were dayîn.

#### **4. Xizmetên bo xizm û kesên goriyên qetlê**

4.1 Kes û girêdayiyên yê qetilkirin ku navê wan di bin hejmarê 1.1 da hatiye birin, bi giştî qasî 100,000,00 Euroyî bedêla her mirinekê werdigirin. Xizmet bi awayê cuda ji bo her daxwazkerê wergirtina xizmetan ku xwedanmerc e, li gorî van qanûn û rêzikan tîn raberkirin.

4.2 Hevjîn û zarokên kesê mirî ji bo wergirtina ji xizmetan mafê wan di serê da ye. Heke hevjin û yek an çend zarok hebin, hevjin nîvê diravê ku li hejmarê 4.1, hevoka 1 hatiye werdigire. Diravê mayî yê zarok an zarokên kesê mirî ye. Heke kesê mirî di dema mirinê da nezewicîbe, zarok an zarokên wî/ê diravê tam li gorî hejmarê 4.1, hevoka 1 werdigirin. Heke çend zarok bin, mafê wan bo wergirtina xizmetan beranber e. Dewsa zarokê ku mirî be, zarokên din pişk û para wan beranber e.

4.3 Heke hevjin an zarok tunebin, dêbavê kesê mirvî nîvê diravê ku li gorî hejmarê 4.1, hevoka 1 hatiye gotin, werdigirin. Heke yek ji dayîk an bavê wî/ê mirîbe, pereyê têkildarî wî/ê bi awayê yeksan navbera zarokan tê parvekirin. Heke tu zarokek ji dayîk an bavê mirî tunebe, dayîk an bavê mayî diravê tam li gorî hejmarê 4.1 hevoka 1 werdigire.

4.4 Hejmarê 4.3 li ser vê esasê tê sepandin, heke

- Tu yek ji xwedîmercên wergirtina xizmetan ku di bin hejmarê 4.2 navê wan heye, daxwaza dayîna xizmetan ji rîya Sindoqa Cebirandina Ziyane Goriyan di dema diyarkirî ya di bin hejmarê 3.5 da raber neke an
- Hemî xwedîmercên wergirtina xizmetan daxwaza xwe ya wergirtina xizmetên Sindoqa Cebirandina Ziyane paşve bikişînin.

#### **5. Xizmet bo kesên ziyandî**

5.1 Her kesek ku di encama her cûre sûcekê ya di bin hejmara 1.1 a zîyanên leşî an saxlemiyê li wî/ê ketine ku hîn nakeve bin sîvana hejmara 4, li gorî rêzîkên li jêrê ziyana wî/ê tê cebirandin. Cubrankirina zîyanê ji bo kiryarên nerasterast bi taybet ji bo kesên ku li cihê qewimîna sûcê nebûne, pêk nayê. Heke kesê/a birîndar di vê heyamê da çûbe ber dilovaniya xwe, hejmarên 2.4 heta 4.4 li ser vê esasê tîn sepandin.

5.2 Cebirandina zîyanê van babetan digire ber xwe

5.2.1 Heke ziyana ciddî ya leşî an ziyana li saxlemiyê be 20.000,00 EUR,

5.2.2 Heke ziyana giran an hema bêje giran a leşî an ziyana li saxlemiyê be, 10.000,00 EUR

5.2.3 Û Heke zîyanên din ên leşî an ziyana li saxlemiyê be 3.000,00 EUR.

5.3 Nirxandina asta zîyanên leşî an ziyana li saxlemiyê bi giştî li ser esasa van pîvanan e:

5.3.1 Girantirîn ziyana leşî an ziyana li saxlemiyê:

- Zîyanên kujer ên giran,
- Destêwerdanên nîştergeriyê pêwîst e,
- Dermankirina razandî ya demdirêj,
- Sînordariyên leşî yê hertimî an dûhatên saxlemiyê;

5.3.2 Ziyana giran an hema bêje giran a leşî an saxlemî:

- Zîyanên ku rûvekî nînin
- Destêwerdana nîştergeriyê pêwîst e an hewcetiya pêwîst a din jibo dermanê,
- Dermankirina bi awayê razandî,
- Pêvajoya baştirbûnê ya navgîndem an dirêjdem;

5.3.3 Zîyanên din ên leşî û saxlemiyê:

- Zîyanên ku demkurt an navgînkurt baştir dibin, bi giştî rûvekî bêyî dûhatan an
- Zîyanên behicîn û şokebûna kesên li cihê bûyerê.

5.4 Heta wê radeyê ku Rêvebiriya Fêdêral a Dadweriyê derbarê dayîna xizmetên şert û mercên dijwar ji bo goriyên êrîşên zêdegaviyê ji mûçeya fêdêral bo daxwazkeran biryar daye, nirxandina hebûn û ciddîbûna zîyanê li gorî nêrîna Rêvebiriya Fêdêral a Dadweriyê li ser naverok û zemîneya îdia û hegera biryarê pêk tê.

## 6. Xizmet ji bo rewşa dijwar

- 6.1 Xizmetên giştalî nikarin tevahiya taybetmendiyên babetên kesane dabîn bikin. Loma beşeka çavkaniyên terxankirî bo Sindoqa Cebirandina Ziyânê Goriyan ji bo cebirandina ziyânê zêdebarî yê mirovan di bin hejmarên 4 û 5, divê ji bo rewşa dijwar a taybet were bikaranîn.
- 6.2 Mûçeya terxankirî li Sindoqa Cebirandina Ziyânê Goriyan ku piştî biryardanê derbarê tevahiya daxwazên raberkirî di dema diyarkirî da bo xizmetên kes û xizmên gorîyên qetlê (Hejmara 4) û xizmetên bo kesên ziyandîtî (Hejmara 5) ji bo van xizmetan hewce nîne, da diravekî herî pirr bi qasî 300,000,00 Eur bo Civata Parêzgehî ya Bêrlînê (Civata Tomarbûyî) ser bi Civata Xêrxwaziyê ya Almaniyayê. Bi navnîşana: Brandenburgische Straße 80, 10713 Berlin (Wergirê xizmetan) tê terxankirin.
- 6.3 Xizmet ji bo cebirandina ziyana li kesên xwedan mafê wergirtina xizmetan li ser esasa hejmara 4 û 5 tî raberkirin û armanca wê babetên nivîsandî li hejmara 2 li bara rewşa dijwar ye.
- 6.4 Xizmet ji mûçeya nivîsanî li hejmara 6.2 li gorî daxwaza wergirê xizmetan pêk tê. Daxwaz divê herî pirr heta 10ê Îlona 2018an were raberkirin. Wergirê xizmetan divê li daxwaza xwe garantî bike ku tu paşdaketina bac û xeracê ya wî/ê tune, tu dosyeya hilweşandinê li dijî wî/ê tune û navê wî/ê li lîsteya deyndaran nehatiye tomarkirin.
- 6.5 Wergirê xizmetan derbarê bikaranîna diravên veguhestî ji bo cebirandina iyana kesên ku di bin hejmarên 4 û 5 da xwedan mafê wergirtina xizmetan in û di bin hejmara 2 di rewşên dijwar da ne biryarê dide û ev dirav bo van kesan tê dayînê. Diravên ku heta roja 30ê Mijdara 2019an derbarê babetên nivîsandî li hevoka 1ê neyê bikananîn, divê bo xizîneya dewletê ya Tûrîngenê bî vegeandin.
- 6.6 Wergirê xizmetan divê roja 31ê Mijdara 2019an belgeyekê li ser xerckirina diravê veguhestî heta roja 30ê Mijdara 2019an radestî Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgi-riya ji Bikarêneran a Tûrîngenê bike. Li vê belgeyê divê ku nav û navnîşana kesê/a daxwazker hebe, her wiha diravê dayî û hinceta ji bo pejirandina rewşa dijwar (Bi

amajeya bi kiryareka taybet di bin hejmarê 1.1) bo her yek ji dayînan be. Fatore û belgeyên dayîna dirêv divê ku piştrastkirî bin.

## **7. Jinûve Dayîn**

Jinûve dayîn û vegerandina xizmetan ji Sindoqa Cebirandina Ziyânê Goriyan li gorî qanûnê û rêzikên pêvajoya dadweriyê ya Tûrîngenê ye. Bi awayekî taybet heke piştra were diyarkirin ku pêşmerca raberkirina xizmetan tunebûye û wergirê xizmetan ji wan behre wergirtiye, xizmetê û diravê divê bêne vegerandin.

## **8. Soza bo Ragihandinê**

Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiriya ji Bikarêneran a Tûrîngenê hin agahî û zanyariyan derbarê îmkana wergirtina xizmetên sindoqa cebirandina ziyânê her wiha pêvajoyê û şert û mercên dayîna van xizmetan li malpera xwe ya bi nîşaniya (<http://www.thuringen.de/th4/>) danîne ber dest. Ji billî viya ev rêzikên cihanîne dê li rojnameya dewletî ya Tûrîngenê bêne weşandin. Ji billî viya, Wezareta Koçberî, Dadwerî û Piştgiriya ji Bikarêneran li Tûrîngenê bi awayekî guncan û munasib hewil dide ku wek mînak ji riya navbeynkarîya dadêner a dewleta fêdêral bona gorî û xizmetê û kesên goriyan ên silûşla Zwickau, da ku agahî û zanyarî di dema xwe da derbarê Sindoqa Cebirandina Ziyânê Goriyan bo daxwazkerê bêne raberkirin; Tu angaştek li vî warî da tune.

## **9. Cihanîn**

Ev rêzik û qanûnê cihê tîni di rojê ...[Binivîse: Demê îmzeyê li bin] û di rojê 31ê Kanûna 2020ê hitbar û nirxa wan radibe.

Êrfûrt (Erfurt), dem

Wezareta Koçberî,

Dadwerî û Piştgiriya ji Bikarêneran a Tûrîngenê

Dîtêr Lawîngêr (Dieter Lauinger)